


*Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*

*wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

**Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî**
**Xelek 12**

# Sedemên Reşkirina Nav û Dengê Kurd di Bermayên Îslamî da

## Destpêk:

Me berê gotibû ku reşkirin û raholkirina nav û dengê neteweya Kurd, reşkirin û bedkirina teybetmendî, dîrok û kok û binyata Kurdan bi awayekî pilankirî û heya bi awayekî dûrî aqilan, dûrî logîk û rastiyê, bi awayekî efsanewî jî di bermayên îslamî da bûbû armanca xwediyên wan berheman. Gava mirov bi hûrbînî li vê êrişa seferber li ser Kurdan temaşe dike, ji xwe dipirse: Gelo sedemên vê êrişa seferber li ser Kurdan çi bûn?

Di rastiyê da ev mijar gelek têkil û lihevketî ye. Rah û damarên vê êrişa seferber vedigerin ser heyama berî îslametiyê bi çend sedsalan. Di heyama îslametiyê da vedigerin ser sê sedsalên destpêka wê. Hemû agahdariyên ku hatine dayîn, ne bi awayekî rêk û pêk hatine qeydkirin; jêderên wan nepenî û ne diyarin. Ew hemû dikevin bin şêweyê: "*Hatiye gotin..., dibêjin..., angaşt kirine..., hin kesan gotiye... û hwd*".

Belkî hin kes bêjin: Faris, Aşûrî, Kildan, Suryan û Ermen jî wek Kurdan ketin bin destê Ereban. Gelo çima tenha Kurd bûn armanca vê êrişa reşkirin û raholkirine?. Daku em bigihînin bersiveka aqilane, ka em bi kurtahî rewşa Farisan û rewşa Kurdan di dema destpêka *Xilafeta Îslamî* da bidin ber hev.

## Cudahiya Rewşa Farisan û Kurdan:

### Yekem - Rewşa Farisan:

Rewşa Kurdan di destpêka heyama îslametiyê da, ji rewşa hawsê û cîranên wan yên Faris cuda bû. Raste ku Farisan dewleta xwe li ser destê Ereban wenda kir. Lê belê ew xwediyên serborî û tecrûbeyên dûr û dirêj di warê siyaset û rêvebirinê da bûn. Pêwîstiya xelîfeyên Ereb - Bi taybetî jî di dema *Ebbasiyan* da - bi vê serborî û tecrûbeya Farisan ji bo rêvebirina kar û barê emperatoriya xwe hebû. gelek wezîfeyên bilind di dewletê da, wek wezaret û karên din yê rêveberiyê dan dest Farisan. Hin malbatên Faris wek malbata El Rebî' (الرَّبيع) Bin Yûnis û malbata Sehil El Serxesî[1] bi pisporî kar û barên wezaretiyê birêve dibirin. Helbete, rola van kesan di bilindkirina nav û dengê neteweya wan da,

wê di çavê xelkê da hebe. Hebûna wan di van meqamên bilind da, bi gelemperî wê nehêle ku her kesek bikaribe tinazî û henekên xwe bi neteweya wan bike, yan jî hewl bide nav û dengê wê reş û rahol bike. Tenha gengaz û mimkine, di astên teng da, tinazî bi hin kesên Faris bê kirin; lê belê ne li ser asta neteweya Faris bi giştî.

Di warê çandî û rewşenbîrî da, Faris berî heyama îslametiyê xwediyên emperatoriyekê bûn. Hin padîşahên Faris kor û înstîtûtsiyonên zanyarî û çandî avakiribûn û bizava pêşvebirina beşên zanistiyê dikirin. Wek nimûne em dikarin *Dibistana Gundê Sabûr* binav bikin, ya ku wek zanîngehekê bû. Ev dibistan ji aliyê padîşahê *Sasanî Sapûrê Yekem* va (kurê *Erdeşêrê Yekem*) ku ji 244 heya 273 z. serdarî kiriye, hatiye avakirin. *Padîşahên Sasaniyan* hin zanyarên mezin yên *Yûnanî û Suryanî*, ji beşên zanyariyê yên cuda û têvel, ji bo hînkirin û perwerdekirina hin nifşên zanyaran ji Farisan, anîbûn vê dibistanê, daku bingeheka çandî, zanistî û rewşenbîrî di civaka farisî da avabikin(2).

Gava Ereban welatê Farisan vegirt, vê bingeha çandî farisî ya berê dikarîbû bi rewşa nû ra bi awayekî erênî bigunce û tevlê bibe. Hin rewşenbîrên Faris bi awayekî xurt di tevgera çandî îslamî da beşdar bûn û di astên zanistiyê yên bilind û warên wê yên têvel da cih girtin. Bi taybetî di warê şîrovekirina *Qur'anê, Hedîsên Pêximber*, *dîrok*, *ziman* û *wêjeyê* da bûn pispor. Ev jî bû sedem ku di bîr û raya giştî da hesteka baş beramber neteweya Faris bê avakirin û wisa ji reşkirin û raholkirinê bê parastin.

### Duwem - Rewşa Kurdan:

Gava Kurd derbasî heyama îslamî bûn, ew ji du hêmanên bingehîn bêpar bûn ku her neteweyek pê tê parastin: *Hêmanê siyasî* (hebûna *dewleta niştîmanî*) û *hêmanê giyanî* (hebûna *rêveberiya ayînî*). Bi gotineka din: Kurd gelekî bê parastin bû, rewşa wî wisa bû ku her kesekî dikarîbû rûmet û payedariya wî bi birîn bike; her dijber û dijminekî dikarîbû derbarê wî da her tiştê ku bixwaze bêje, bêyî ku aliyekî siyasî, rêveberî, yan çandî yan ayînî li hember tiştê ku tê angaştkirin derkeve û bêbingeh bike.

Ji her kesekî va diyare ku çanda serdest li *Rojhilata Navîn* ji heyamên kevin da wisa ye ku çandeka tinekirin û înkarkirina kesên dine. Ne bes wisa jî, çandeka wisa ye ku hewl dide yê din tineyî bike û ji dîrokê bavêje derva. Herdem wisa bû ku şiyan û serdarî, dewlemendî û çand di destê yê hêzdar da bû; rûmet û payedarî tenha ji xwe û piştgirên xwe ra didît û çarenûsa yên din jî pişaftin û tinekirin bû, yan jî ew têvedidan radeyên here nizim, nav û dengê wan rahol dikirin; qerf û tinaziyên xwe pêdikirin. Ji ber ku kan û dergahên şiyan û serdariyê, yên dewlemendî û çandê ne di destê Kurdan da bûn, ji ber wê jî cihê wan bi dîtina siyasî û civakî, ya dijberên wan, cihê herî nizim bû û dibûn armanca qerf, tinazî û raholkirinê.

Bi sedema tinebûna dewleta navendî-niştîmanî ji bo Kurdan ji sala 550 b.z. da, civaka Kurdan, ne bi rewişt û taybetmendiyên bajarvanî, lê belê bêhtir bi rewiştên jiyana gundîtî û şivantiyê dihate naskirin; Kurd ji serwerî û dewlemendiyê hatibûn bidûrxistin. Beşekî biçûk ji dewlemend û rewşenbîrên

Kurdan ku di dezgehên dewletên dagîrkerên Kurdistanê da dixebitîn û cih girtibûn, wek dezgehên siyasî, rêveberî yan jî çandî, bi demê ra di nav neteweya farisî da hatibûn pişaftin û asîmîlekirin; û li kurdîtiya xwe xwedî dernediketin. Vê diyardeyê û vê rewşa kambax ya Kurdan di heyama îslamî da jî berdewam kir, heya ku rêveberên hin malbatên Kurdan yên di warên siyasî û ayînî da navdar bûbûn, angaşt dikirin ku ew ji kok û binyateka Erebin; ji rah û hozên Umewî, yan Ebbasî, yan Elewî yên êla Qureyşiyane.

Ka em wek nimûne *Abu Mislimê Xurasanî* binav bikin. Vî rêberê leşkerî zora leşkerên dewleta *Umewî* bir, û ji kesayetiyên here girîng bû di avakirina dewleta *Ebbasî* da. Lê belê ew wê demê nedihate naskirin ku ew bi kok û binyata xwe Kurde. Ew hin caran ji Farisan dihate hejmartin û bi xwe gotibû ku ew ji nifşe *Ebdullah Bin El Ebbase* (bapîrê xelîfeyên *Ebbasiyan*). Lê belê gava xelîfeyê *Ebbasî* yê duwem *Abu Cehfer El Mensor* ew ji Xurasanê vexwende qesra xwe û bi îxanetî ew kuşt, hîngê helbestvanê xelîfe yê bi navê *Abu Dulame* bi peyvan êriş wî dike û dibêje:

"*Te di dewleta El Mensor da xwest tu îxanetiyê bikî,*

*yên îxanetcî bav û bapîrên te yên Kurdin*"[3].

Heger ne ev êrişa zimanî ba, wê ticar nehatiba naskirin ku *Abu Muslimê Xurasanî* bi kok û binyata xwe Kurde.

Wisa jî rewşa wezîrên *Bermekiyan* bû. *Xalid Bin Bermek* di dema xilafeta xelîfeyê *Ebbasî* yê yekem da, *Abu El Ebbas El Seffah* (sala 136 goçî wexer kiriye) bûbû wezîr. Di pey ra kurê wî *Yehya Bermek* di dema xelîfe *Harûn El Reşîd* (sala 193 goçî wexer kiriye) da bû wezîr. Di hukumdariyê da herdu kurên wî *El Fedil* û *Cehfer* jî beşdar bûne; ew di hemû warên dewletê da gelek bi bandor bûn. Heyanî ku *Harûn El Reşîd* di sala 187 goçî da ew bi hovîtî perçiqandin, her kesî bawer dikir ku ev malbat malbateka Farise. Lê belê yek ji neviyên vê malbatê bi navê *Ibin Xellikan* (sala 681 goçî wexer kiriye) ku hem qadî û hem jî dîrokzan bûye, ji kurê xwe *Musa* ra gotiye ku bapîrên wî yên *Bermekî* Kurd bûne, û ew ji êla *Zurzarî* ne (kurê guran). Bêyî vê agahdariya *Ibin Xellikan* wê her kesî hên bawer bikira ku *Bermekî* bi koka xwe ji Farisane[4].

Rewşa Kurdan di warê çandî da jî, ji rewşa wan ya di warên siyasî û rêveberî da ne çêtir bû. Rewşenbîrên Kurd yên berî heyama îslametiyê - tevî ku kêm bûn jî - ji dezgehên çanda farisî derketibûn, û di wan da perwerde bûbûn, û bi wê rewşê derbasî heyama îslametiyê bûbûn. Di pey ra hinek ji wan bi çanda erebî perwerde bûn. Tevî ku hinek ji wan di warê zanistiyên ayînî, zimanî, wêjeyî û dîrokî da gihîştin astên bilind jî, lê belê nedigotin ku kok û binyata wan Kurde; bi vajayî pir rewşenbîrên Faris ku bi kok û binyata xwe ya farisî serberz û serbilind bûn. Wek helbestvan *Ismaîl Bin Yesar* û wêjevan *Ibin El Muqefe'* û wek zimanzan *Abu Ubeydeh Me'mer Bin El Musenna* (أبو عُبَيْدَة مَعْمَر بن المُثَنّى)[5].

Wek rewşebîrên mezin yên Kurd di sê sedsalên goçî yên pêşîn da, em dikarin rexnevan *El Hesen Bin Bişir El Amedî* (ji Amedê) û *El Cuneyd* şêxê sûfiyan (ji bajarê Nehawend, başûrê rojhilatê Kurdistanê) û Ferhengvan *Abu Henîfeh El Deynewerî* ( ji *Deynewerê*, başûrê rojhilatê Kurdistanê) û *Cunbilanî* (ji Cunbila, başûrê Kurdistanê) ku ew yek ji zanyarên mezin yên Elewiyane, û her weha gelekên din ku em wan tenha bi rêya bajar û êlên wan nasdikin.

Bi şêweyekî gelemperî, bidûrketina Kurdan ji warên siyasî, rêveberî û çandî, bi taybetî jî di sê sedsalên goçî yên pêşîn da, bû sedem ku Kurd bibin gelekî bê parastin û rêveberî û wisa bi hêsanî bibin armanca reşkirin û raholkirinê.

Tenha ma ku em bipirsin: Gelo kî li paş vê êrişa reşkirin û raholkirinê bû?.

## Jêder

[1] Ibin Xelkan: Wefeyat El E'yan, 2/294, 4/37, 41. Dr. Hesen Ibrahim Hesen: Dîroka Îslametiyê, 2/259, 261.

[2] Ibin El Esir, El Kamel fi El Tarix, 1/335, 397. Dr. Hesen Ibrahim Hesen: Dîroka Îslametiyê, 2/345.

[3] El Tabari, Dîroka El Teberi, 7/491- 492. Ibin Xelkan, Wefeyat El E'yan, 3/145 - 155.

[4] Ibin El Cewzî, El Muntezem fi Tarix El Mulûk wel Umem, 7/299. Ibin Xelkan: Wefeyat El E'yan, 4/9

[5] Huseyn Qasim El Eziz: El Babkiyeh, rûpel 101.